

Divê çarenivîsa girtî û revandiyan were eşkere kirin

Kurdistan Jiyana Omer



Yek ji xalên nakok yên danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî ENKS û partiyên Yekîtiya Niştîmanî

PYNK pirsra girtî û revandiyan e ku ji aliyê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê û çekdarên ser bi wê ve hatine revandin. Mihemed Xalid

wiha li ser vê mijarê dibêje: Nabe ev pirs bê piştguhixistin û divê ENKS rijd be li ser eşkerekirina çarenivîsa girtî û revaniyan û di serê

wan de Endamê Mekteba Siyasî ya PDK-S Behzad Dorsin. PYD hewil dide xwe ji vê mijarê birevîne, lê divê ENKS dev jê bernede.

Sîham Xidir jî wiha dibêje: Hin alî dibêjin ji bo yekrêziyê di vê hesankarî were kirin û astengî nemînin, ez jî ligel wê nerîne me, lê divê pirsra girtiyan

were yekalî kirin û êdî malbatên wan vehesî bibin daku çarenivîsa girtiyan xwe bizanin.

Çîma hin alî xwe ji erk û berpirsyariyên yekrêziyê direvîn

Kurdistan-Îman Xalid

Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) radigihîne, di dema ku gelê kurd li benda nûçeya bidawîbûna rêkeftina yekrêziyê ye, hin berpirsên aliyê din (PYNK) dixwazin ji erkên xwe direvin. Nivîsgeha Ragihandinê ya ENKSê îro daxuyaniyek derbarê diyaloga kurdî - kurdî de belav kir û tê de tekez kir, ji bo bidestxistina mafên gelê kurd li Sûriyê, yekrêziya helwesta kurdî yek ji armancên sereke yên ENKSê ye. ENKSê di daxuyaniya xwe de ragihand, ENKSê ji rêkeftina Hewlêr û ta rêkeftina Duhokê bi dilsozî kar ji bo yekrêziya kurdî kir. Bi erênî jî bersiva destpêxeriyên yekrêziyê da. Di destpêxeriyê dawiyê ya bi serperîştîya Amerîka encam dabû de, ENKSê ji bo serxistina wê, gelek hêsankarî di danûstandinan de pêşkêş kirin û gavên baş jî tê de hatin avêtin. ENKS dibêje: Di dema ku gelê me li benda nûçeya bidawîbûna rêkeftinê bû, gelek daxuyanî ji aliyê berpirsên aliyê din derketin. Armanca ji wan daxuyaniyan ew e, ji erkên ku ji wan tî xwastin birevin û gûmanê bixin rastiya proseya danûstandinan de.

ENKSê tekez kir jî, ew pabend in bi proseya danûstandinan ya tê kirin û gelê kurd yê berjewendîya xwe dizane, bi tometan û listina bi hestan neyê xapandin.

Ev daxuyaniya Nivîsgeha Ragihandinê ya ENKSê di demekê de ye, Endamê Desteya Serokatiya PYDê Aldar

Xelil ji medya partiya xwe re ragihandibû, diyaloga di navbera PYNKê û ENKSê de gehîştine rêyeke girtî û rawestiya ne. Endamê Desteya Serokatiya ENKSê Nîmet Dawûd ji kenala Kurdistan24 re Diyar kir jî, niha danûstandin li ser pirsê îdarî ye û wan gelek gav tê de avêtine û tenê xala tevlibûna ENKSê di nava Rêveberiya Xweser de maye û ti pirsgerêkên gelek

zehmet tê de tune ne û dê biçê serî. Aşkere kir jî, hin pirs hene bi aliyê serperîşt (aliyê Amerîkî) û Fermandarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî re tî guftûgokirin, ji wan jî pirsê xwendin û perwerdehiyê ye û got: "Em gihîştin hevtêgihîştinekê ku îsal xwendekar azad bin kîjan mînhacê bixwînin û di pişt re emê çareseriyekê ji bo mînhacekê ku ji aliyê UNISEF ve danpêdan

pê hebe bibînin, ji bo xwendekar bikarin cihên xwe di zanîngehan de bibînin." Li ser pirsê leşkerî, endamê Desteya Serokatiya ENKSê da zanîn, hîna danûstandin li dosya leşkerî nehatiye kirin. Piştî dosya îdarî, dê danûstandin li dosya ewlehî û leşkerî bê kirin. Herwiha got: "Bawerîya me heye ku ev diyaloga dê bi ser bikeve. Di her danûstandinan

de pirsgerêk û astengî derdikevin. Em wek ENKS jî dibînin ku çî pirsgerêk û astengî derkevin, emê bikarin çareser bikin û dê encam ji vê diyaloga ku çavê gelê me lê ye derkevin û hêviyên mîletê me biçin bibin." Li ser pirsê perwerdehiya bi zamanê kurdî, endamê Desteya Serokatiya ENKSê tekez kir: "Em di Teverga kurdî dî ji 63 salan ve ji bo zimanê kurdî dixebetin. Pirsê

perwerdehiyê, pirsê raya giştî ye û çavê xelkê lê ye ku zarokên wan bê xwendin mane û ti danpêdan bi bawernameyan wan tune ye. Bi hezaran gelê me bar dikin parêzgehên din ji bo zarokên xwe bi xwendin bidin. Xelk dixwazin danpêdan bi bawernameyan zarokên wan hebe û çareseriyekê jê bê dîtin. Îsal me pirsê xwendinê azad kir, lê di piştê emê çareseriyekê bi temamî ji pirsê xwendin û perwerdehiyê bibînin. Pirs, ne tenê zimanê Kurdî ye. Ev pirsê perwerdehiyê ye û tê de bawernameyan zanistî tî wergirtin û qebûlkirina di zanîngehan de tê de heye. Em xwediye pirsê zimanê kurdî ne, emê çawa li dijî zimanê kurdî derkevin, ti carî ev yek ne rast e. Divê ev daxuyanî ji Serokê şanda PYNKê derneketiba". Mihemed Ibêd jî li ser vê mijarê wiha dibêje, heger hat û mijara yekrêziya Kurdî Kurdî li Kurdistana Sûriyê neçe serî dê xelk û neviyên me PYDê şermezar bikin ji ber ku ev yek si stoyê wê de ye û ew xwe ji van berpirsyariyan direvîne, divê ev partî ji PKKê were qutkirin û bi mejiyê Kurdên Sûriyê kar bike daku ev pirsê bidawî were. Cihan Omer jî wiha dipirse gelo çîma hin alî naxwazin ev yek biçê serî, bi rastî cihê matmayîne ye, ew alî ji berjewendiyên xelkê din re kar dikin û ew alî ne ji berjewendîya wan Kurdên Sûriyê bighên mafên xwe ya giring li cem wan ew e ku ew biserkevin û pereyên xwe werbigrin herwiha dizîya wan jî berdewan be.



Yadgariya sêsalîya Dastana Pirdê



Se'îd Umer

Wergerandin :
Kurdistan Elî

Lehengiya Gelê Başûrê
Kurdistanê di Şerê
Pirdê de ji hemî Pesna
û Navtêdana bilindtir
û binixtîre, herweha
Rûpelên zêrîn wê
Rojê hatin nivîsîn,
û Şerefmendiyek
mezin bû ji Malbatên
Kurdperwerên
Dîrokî re kû bi
Şehnazî û serbilindî
berve Jiyaneke Azad
û serbixwe diçin



û Dewelet bûna
Kurdistanê misoker
dibêt, biser her Astengî
û dijayetiye di Rêde.
Ev Rûpelê Dîrokê ji
vê Dasîtana Lehengî
û Mêrxasiya kû em pê

Ser firaz û Ser bilindin
dimînin. di Roja 20 /
10 /2020 de Hêzên
Bijarde yê (P D K)
berî kû berê xwe bidê
Pirdê û Sengrên şer
Serkirdeyêkî wê Hêzê

Gotinek pêşkêşkir û
weha got: Hêza Îraqî
û Heşda Ş'ebî xwe
Amedekirne kû Êrîş
bikin li ser Hewlêra
Paytext û di nav Rêzên
wede kesên Xwedî

Xêzan û Zarok û
bargiran hene, yanjî
hindek kes hebin
naxwazin Jiyana wan
bi bilez bi domahî
bibê, Jiyana ji Mafê weye
û Heskirina jiyane

Mafê her yekîye, em
jî li pêşiyê Biryara we
narawestin û di Rêya
kesekî de nasekinin,..
Yê bixwazê li gel me
bê yan jî nexwazê
ew Bijare ya wiye,
her weha Serkirdeyê
leşkerî got û Gotina û
berdewam kîr : Emê
Pîştî Demek kurt berê
xwe bidin vê Hêza kû
dixwazê Kurdistanê û
Xaka wê ya bi Rûmet
Dagîr bikê û cardî
bikê bin Hukumdariya
Bexdayêde piştî nêzîkî
26 şêş Salan ji Henase
û Bayê Azadiyê, Em
nahêlin kû ew Hêz
derbas bibê, tenê jibilî
li ser giyanê mîre
derbas bibê, jibo wisa
cardî dubare dibêjim:
kesên jiwe bitirsê li ser
Malbat û Zarokên xwe
û nikaribê derbasî vî
Şerê giran bibê hemî
Maf pêreye kû vê gerê,
dîsejî ew serbest û
azadê Biryara xweye,
her wê bimînê cihê Rêz
û hurmetê li gel me, û
ti Nêrîna xerab û nebaş
li wan nayên girtin.
Her dîse digot ... heger
em çûn Meydana Şer
emê nehêlin Dijmin
derbasî Hewlêrê bibê
yanjî Bostek xak vegirê,
yan dagîr bikê ne li
ser Giyanê mebê, Jibo
wisa çî kesekê kû ligel
me dimeydan şerde
xwe bibîne divê xwe
ji hejmara Şehîdan
hasab bikê ji nihove.
Pîştî wê Hêza Leheng
ew Gotin û jiravekirin
bihistin yek Pêşmergên
Leheng ji biryara xwe
ne vegera û bi yek
Dengî bankirin... Yan
kurdistan yan neman
û dest bi Dirûşm û
Siloganên Azadiyê
kirin...Yan Kurdistan
yan neman.. û bi Sirûda
Eyreqîb û bi Hestên
Netewî li Otombêlên
xwe yên Leşkerî siwar
... bûn û berê xwe dan
(Pirdê) Serkevîna
Îro ku em pê wê dijîn
bi Dest xewe anîn.
Dastana Pirdê bû
wanyek dîrokî ji Dost û
dijmnan re.

Sehê Mîrî û Mamoste



Mahir Hesên

Rojekê ji rojan, mîr li hespa
xwe siwar bû û kete ser rê
bi nêta nêçîrê, sehê wî jî
da pey, wesa dem derbas
bû, hêdî-hêdî roj diçû ava û
tîrêjên wê xav û sist dibûn
. Weha rojê xwe bi kirasê
reng agirî dapoş kir. û asoyê
mîrgehê sor bû .
Mîrî xwe berhev kir û berê
xwe da ser rêka vergera
mîrgehê, bi rê de simê hespê
mîrî kete qelşekê de û pê-
pêre lukimî û lingê hespî
şikest.
Mîr neçar ma û nema
karîbû rêka xwe ya vege-
berdewam bike.

Mîrî, ji sehê xwe re got:
- Em ê îşev, li vê bêlanê
xewkin heya sibê Xwedê
kerîm e.
Wê şevê seh ma şiyar û

zîrevaniya mîrî, ji teba û
giyanewerên dirinde kir.

Bi berbanga sibehê re, mîr
şiyar bû û meyzekir ku seh
hîn şiyar e û wî diparêze .
Mîr gelekî, ji sehî razî bû û jê
re got:

- Ji bo dilsoziya te , ez ê te
xelat bikim.

û çawa mîr gihîşt mîrgehê
şînî û akincihên/niştêcihên
mîrgehê kom kirin û ew
agehdar û şîret kirin ku rêz
û qîmeteke mezin, bidin
sehê wî û çî pêdiviyên
xweşkirina jiyane , jê
re dabîn bikin. Lewma
niştêcihên mîrgehê , bi
dilxweşî biryarên mîrî, bi
cih anîn û bi derbasbûna
rojan re, xwedîkirina
sehê mîrî bû yek, ji erkên
şîniyên mîrgehê . Heya ku
navûdengê sehî, li tevaya
herêmê belav bû.

Seh pir qure bû û ku dikete
kewarên zadî û kozikên
gundiyan, ewî mirîşka herî
baş dibir û tu kesî, ji tirsê
mîrî newêrî bû zixurekî jî, li
wî sehî wer bike .

Bêhna gundiyan pir, ji sehî

teng bû û giha asteke berz,
lê tu tişt bi destên wan ve
nedihat .

Rojekê, mamostayekî nû
hate mîrgehê , û bala xwe
dayê ku tu kes nikare
kiryarên sehê mîrî
rawestîne û tu çareyekê
bibîne, Heya rojekê
mamoste pêrgî sehî hat û jê
re got :

- Heger tu li xwe venegerî ,
wê paşeroja te gelkî xerab
û çepel be . Baştir e ku tu
dev ji van tenazokan berde.
Sehî bi difinbilindî ve, lê
vegerand û got :
- Sehê Mîrî Mîr e .
û guh neda peyvên
mamosteyî û dûvê xwe
hejand û çû .

Mehek du sê û her seh ma
weku xwe û reftarê xwe
neguhertin.

Şevbihêrkekê, ji şevên ku
çivat , li oda mîrî geryaye
û mamoste jî, lê amede ye,
mîrî got:

- Mamoste ka, ji me re
behsa serpehatiyên xwe
bike .

Mamoste got:

- Mîrê min , hûn ê ewlehiyê

bidin min?

Mîr got:

- Fermo çî heye ?

Mamoste got:

- Xelk û 'alem sixêf û
dijûnan, ji te re didin û te
ageh jê nîne û nizanî .

Me'dê mîrî, li hev ket û pêt
ji devê wî çûn , û bi dengekî,
bi hêrs got:

- Kî wê wêrekiyê , di xwe de
dibîne ku di derheqê min
de, min şaş bibe ???

Mamoste got:

- Mîrê min , li herêmê tevî
dibêjin; sehê mîrî, wateya
wan tu sehî, ne seh ye mîr
e. Ya baş ku tu xwe, ji vî
sehî xilas bikî , da navê
te, bi navê sehî re nehête
hermandin .

Mîrî, bi lez da xwe ber bi
hewşê ve çû û bivirek, li
pêşiya xwe dît , bivir rakir
û bi hemû hêza xwe, li ser
sehî xist û seh ket û mir .

Mîrî gazî xulam û
xizmetkarên xwe kir û got:

- Herin wî sehî binax bikin .

Ya dinî rojê, mamoste çû ser
gora sehî û got:

- Min ji te re negot , tu carî
Seh nabin Mîr .

Nezîr Gumuş: Bandora Melayê Cizîrî gelekî li ser Mela Sîraceddîn Xelîlî hebû

(2 - 2)

Kurdistan-Sîpan Xelil

Piştî belavbûna berhema "Gulcivîn", Rojnameya Kurdistan hevpeyvînek taybet bi Nivîskar Nezîr Gumuş re pêk anî ku ev jî beşê duyem ji vê hevpeyvînê ye.

• Di plana te de heye tu berhemeke din ya Mela Sîraceddînê Xelîlî amade û berhev bike? Berhemên Mela Sîraceddînê Xelîlî yên ku gihane me sê ne: Durra Birincî (Mewlûda Kurmancî), Gulcivîn (Dîwan), Şîretên Hekîm Loqman. Berhemên Mela Sîraceddîn yên ku negihane me jî hene. Çi qas berhemên wî negihane me, ji sedî sed ne zelal e; lêbelê berhema bi navê Gulbihara Kurdan yek ji wan e. Ev berhem niha winda ye. Kurê wî dibêje ku ev berhem di demên ku pirtûkên Kurdî qedexa bûn de, me veşartîye û niha jî nexuya ye. Bi rastî min dixwest ez vê berhemê bibînim û çap bikim. Lêbelê ev ê bibe nesîb an na, ez nizanîm.

Wekî dî jî min mewlûda wî ya bi navê Durra Birincî jî latînzê kiriye û hinek lêkolîn li ser kiriye û ji bo çape amade ye. Heke em derfetê bibînin em ê wê jî çap bikin.

• Bandora Sîraceddînê Xelîlî çawaye li ser? Di dema ku Mela Sîraceddîn dîwana xwe pêk aniye de zext û zor li ser Kurdan û zimanê Kurdî pir zêde bûn. Ji ber bê yekê gelek caran haya helbestvanan ji hev çenedibû. Yanî mimkun bû ku du helbestvanê cîranên hev bi hevdu nizanîbana. Gelek caran zarokên helbestvanan jî di derbarê nivîs û xebatên bavê xwe de tiştê nizanîbûn. Ji ber vê, Mela Sîraceddîn bandoreke çawa li derdora xwe kiriye em vê baş nizanin. Lê em dizanin ku kesên haya wan jê hebûn di bin bandora wî de diman. Gelek kesan helbestên wî ji ber dikirin. Ez di wê baweriyê de me ku Dîwana wî di demê kin de wê bandoreke erênî li ser xwendevanên Kurd bike. Lê em vê jî baş dizanin ku bandore Melayê Cizîrî


gelekî li ser Mela Sîraceddîn çêbûye. Gelek caran navê Melê jî di helbestên xwe de derbas kiriye. Mela Sîraceddîn Dîwana Melayê Cizîrî bi destxetê xwe jî nivîsandîye û ev nusxe niha mewcûd e.

• Berhemên te yên nû çi ne? Niha xebateke nû di destê min de nîn e. Jixwe ev xebata min nû derket. Ez bi xwe jî hinek helbestên klasîk dinivîsim. Helbestên min niha hindik in, lêbelê ku hinekî ez bêhna xwe vekin ez dixwazin têra dîwanekê helbestên xwe binivîsim. Wekî dî jî jixwe li Bakur rewş tevlihev e û ev bandoreke neyînî li ser her tiştî dike.

• Axaftineke te ji bo xelkê Kurdistanê Sûriyê çi ye?

Bi rastî li Kurdistanê Sûriyê ji bo Kurdan niha rewşeke awarte heye. Belê li her derê rewşa Kurdan wilo ye, lêbelê ya Sûriyê belkî serê sed salî carekê halo çêdibe. Ji ber vê yekê divê gelê Kurdên Suriyê û yên her aliyê dinyayê jî ji bo ku statuya Kurdan baştir bibe û xira nebe, bixebitin. Ya herî girîng jî ew e ku Kurd pêşiyê li nêzik û dûvre jî berfireh yekîtiyêke xwe çêbikin. Kesekî ji şerqê û yekî ji xerbê ji bo berjewendiyêke piçûk tene cem hev. Lê Kurd ji bo feydeyêke çarqozî çima li hev nakin, ez vê fêhm nakim. Yekîti herduyan sax dike û dubendî herduyan dike. Lê dîsa jî çima ev yekîti ew qasî zor û zehmet e, îzaha wê nîn e. Divê Kurd vê fêhm bikin; ketina birayê wî nabe serkeftina wî. Ya dî jî li gorî min heta ku rêya aşîtiyê heye divê Kurd aliyê şer hilnebijêrin.

"Aşîti pariyê feqîra ye, şer nanê zalim û hêzdar ye." Kurd niha feqîr û ze'îf in û aşîti li feydeya Kurdan e. Pêşiyê bi birayê xwe re û dûvre jî bi cîranê xwe re aşîtiyekê divê em pêk bînin. Belkî ji bo Kurdên Bakur lazim e em bibêjin, lê dîsa jî "Zimanê me hebûna me ye, divê em zimanê Kurdî ji zarokên xwe re bibêjin û jiyana xwe bi her aliyê bi Kurdî bijîn. Û spas û serkeftin.



Çîçekên Jînê



Kemal Sîno

Em çîçekên jînê ne
Hêviya bav û dê ne
Paşeroja welat in Sitêrên
Rojhelat in
Em negêj û nezan in
Em mafê xwe dizanin
Erkê li ser xwe dikin
Mafê tu kesî naxwin
Hûn me bê can dibînin
Ramanên me naxwînin
Nexweşî ne ya me ye
Ku hebe ji cem we ye
Em çîçekên jînê ne
Hêviya bav û dê ne
Paşeroja welat in
Sitêrên Rojhelat in

Tîrêja Dastana Sihêla

Emel Hesên

Tîrêj ji roka rojê
pêt û birûsk da
Ronak ji ronahiya
heyvê şewq û şeveq
da
Sitêrên şeva reş çira
û ronî da
Xemila pêşmerga
Cihanê reng da
Dahola Cengê Sihêla
li da
Hêza Pêşmergan
govend neberdn
Leşkerê Roj wan
serî hildan
Bi Saz û awazan
dîlan wan gerand
Şervanên dozê û
lehengên rojê
Bi Tip û hawinan

besiva wan dan
Dijminan ji tersa
wan
Mîdan berdan Li
ber destên
Şêran poşmaniya
xwe dan
Mêxwaz û dilê û
Xoşnav û Barzan
Serbaz û Rêbaz û
Beyaz û Benaz
Bi Ceng û bexwedan
Ala hildan
Bi Can û Bi Xwîn em
bi te re Barzan
Dayîkên hêja kezeb
Xelat dan
Şoreş nav Welat ta
nav û deng da
Bi Xwîna zelal xaka
xwe av dan
Biharek azad di nav
de razan

